



**Dr Nûredîn Zaza**  
1919- 1988



**Osman Sebrî**  
1905 - 1993

*Ji weşanên  
Partiya  
Yekîtiya  
Demokrat  
a Kurd li  
Sûriyê -  
YEKÎTÎ*

Xebat ji bo :

- \* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
- \* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
- \* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de

## **22-ê Nîsanê Cejna Rojnamevaniya Kurdî ye**

Li 22-ê Nîsana sala 1898an, xebatkarê Kurd ê gewre, lawê mîrê Cizîra Botan, rewşenbîr û zanyarê nemir "Miqdad Midhet Bedirxan", di dîroka gelê me ya nûjen de, yekemîn car, rojnameyek bi zimanê Kurdî, tîpên Erebî û bi navê KURDISTAN li paytexta Misrê(Qahîrê) weşandiye. Xwedî û berpirsiyarê rojnamê, armancên xwe bi zelalî di hejmara pêşîn de destnîşan kirine, daye zanîn ku zimanê Kurdî, ji zimanê gelên dever û yên cîhanê ne qelstir û ne kêmtir e, rojname, kovar û pirtûkên cûr bi cûr dikarin pê bêne nivîsandin, çapkirin û weşandin. Herweha, wî aşkere kiriye ku ewê di warê zanîn, aborî û huneran de şîretan li Kurdan bike, dibistan û zanîngehên qenc li kû derê hebin, ewê cihê wan şanî Kurdan bike da ew zarokên xwe rêkin wan dibistanan, zanîn û huneran jê wergirin.

Lê, sed mixabin ku Sultan Ebdilhemîd ê xwînrêj digel şewirdarên wî yên bê ol û bêbext mîna "Abu Alhuda", zor dane xwediyê rojnamê, da ew weşana wê ji ser xaka dewleta Alî Osman rawestîne. Piştî rawestana kurtedemekê, rojnamê cihê weşana xwe ji Qahîrê guhestiye Ewropayê û jiyana xwe berdewam kiriye.

D.R 11

**Di siyaseta hundirîn  
de, paşveçûn !**

**N. Rozad Elî**

**5**

**Dadweriya  
aqilmendekî**

**N . Rêberê Silivî**

**6**

**Xema Giran**

**N. Enehîte Murad**

**7**

**Serokê DTP Xelata  
Zimên Werdigre**

**Am: Hesenê Cumî**

**9**

Nûçe û Çalakî

Nûçe û Çalakî

## Mihemed Fehîm ê Mele Hesên

### Koça dawîn bar kir

Roja Duşembê 30.03.2009Z, li gundê **Cimayê**, dilê hevalê me yê hêja **Mihemed Fehîm** (Bavê Azad)

rawestiya. Piştî nîvro, bi beşdarbûna cemawerekî mezin û gelek heval, dost, komên folklorî, nûnerên partiyên

Kurdî û xelkên gundê

wî "**Cimayê**", termê wî li mezalê gundê **Xizna** ku derdora 20km bareşî bajarê **Qamişlê** ye hate veşartin. Hevalê **M.Fehîm**, mirovekî Kurdhez û di malbateke welatparêz de mezin bûye, ji biçûkaniya xwe ve, barê kurdîtiyê hilgirtiye ser milên xwe û kar û xebat di ber doza gelê xwe ya dadmend de kiriye. Raste ku ta roja dawî ji temenê xwe ew hevalê partiya me bû jî, lê di naverok û rastiya xwe de, ew hevalê hemî hêz û partiyên Kurdî li Sûriyê bû, ji daxwazkerên yekîtiya tevgera netewiya kurdî bû, ji hezkerên tevgera netewiya niştimanî bû û herdem daxwaza pêşvebirina têkiliyên dostane bi hêzên Erebî û Asorî re dikr. Hevalê **M.Fehîm**, di xortaniya xwe de, di ciwaniya xwe de, di rojên ku karê Kurdayetiyê bi tirs û saw bû, ji bo dermankirina derd, kul û êşên gelê xwe, ji bo wekhevî û azadiyê xebateke bê westan kiriye, ji ber wilo jî, ew li nik gelê xwe cihê rêzgirtineke balkêş bû.

Bila serê malbat, heval, hogir , kes û kurên wî sax be û cihê wî buhuşt be.



## Xelata O . Sebrî ya siyem

Di sala 1998 an de, çend rewşenbîr, nivîsevan, helbestvan, û rojnamevan, bi boneya 93 saliya ji dayîkbûna Apo Osman Sebrî li Şamê civiyan. li dawîya civînê pêşniyarek hate holê, ku xelatek bi navê wî bête damezrandin, ji bo kesên biyanî, ku xebatên hêja ji bo gelê kurd kirine, were pêşkêşkirin.

Di sala 2000î de cara yekê bû ku,

" **Komîta Xelata O. Sebrî** "

bervedêrê doza gelê Kurd, civaknas û nivîskarê Tirk, por. Îsmâil Bîşekcî

xelat dike. Û di sala 2004 an de, dayîka Kurdan, xanima rêzdar Danyêl Mîtîran hate xelatkirin.

Îsal 2009 an jî, cara siyem ku, dostê gelê Kurd rêzdar Dr. **Munzir El-Fedil**, di 04-04 2009 an de, li Stockholmê tê xelatkirin. Daxuyaniya komîtê, ya ku , di 28. 09. 2008 de hatibû weşandin, wî weha dide nasîn :"  
**Dr. Munzir El-Fedil kesayetiyeke Ereb e û ji Îraqê ye, li bajarê Necefê ji dayik bûye . Weke tete zanîn jî, bajarê Necefê bi gelek nivîskar, helbestvan û siyasetmedarên xwe navdar e. Şêxê helbestvanên Ereb Muhemed Mihdî El-Cewahirî jî ji bajarê Necefê bû, ewî dastaneke helbestî pir nirxbuha ji zû de terxandibû Kurdistanê, gelê Kurd û serokê nemir Mile Mistefa Barzanî. Neweyên Kurd, ku bi zimanê erebî dizanin, herdem wê dastanê dixwînin û xwe pê şanaz dibînin"**



Nûçe û Çalakî

## Birêz Derwêşê Derwêş Bi cavsorî hate cezakirin!!

Nûçe û Çalakî

Diho, roja yekşembê 22ê Avdarê, ji ber xebata wî di ber ziman û toreya kurdî de, ji ber xwedîderketina wî li zimanê dayika wî, nivîskar û zimanzanê Kurd birêz **Derwêşê Derwêş** ji bal dadgeha leşkeriya **Qamişlo** ve bi 3 meh zindan û 50î hizar pereyên Sûrî hate cezakirin. Ji ber rewşa wî ya tenduristî ya taybet, zindankirina wî sivik kirin, daxistin 13 rojan, wan rojên ku berî niha di zindanê de derbas kiribûn.

Mixabin ku îro rewşenbîr û torevanên Kurd, di sedsala 21an de, ji derveyî hemî perensîpên mafên mirov û yasayên navnetewî, ji ber xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe yê zikmakî têne darizan û cezakirin. Bi rastî, ev reng-têkiliya dewletan bi gelên xwe re ji bilî Sûriyê û Îranê li tu dever û welatan nayê dîtin.

Em dixwazin ji berpîrsên dewletê re bibêjim: Eger hûn di wê gumanê de ne ku bi van biryarên cezakirina çalakvan û rewşenbîran û fermanên qedexekirina zimên, wê zimanê Kurdî ji holê rabe û gelê Kurd bi hêsanî bê pişaftin, hun gelekî şaş in!! Gelê Kurd ku bi hizarên sala ye bi zimanê xwe dijî, zimanê dayika di jiyana xwe ya rojane de bikartîne, ziman , hest û giyanê wî bi hev re hatine hûnan, tucarî ew ji hev nayên veqetandin, ango, ta ku Kurdek li ser axa welatê xwe bijî, dê ala zimanê Kurdî berz û bilind be, dê bi vî zimanê şêrîn bê axaftin, pê xwendin û nivîsandin berdewam be.

Wê pir baş be, li xêra welatê me Sûriyê be ku karbidestên dewletê zimanê Kurdî serbest bikin, van qeyd û bendan ji ser rakin da ku ew jî li kêleka zimanê Erebbî, Siryanî, Ermenî...jiyana xwe ya normal bijî. Herweha em di wê baweriyê de ne ku tu berjewendiya gelê Sûriyê, ne jî ya

destelatê di berdewamiya vê siyaseta tund û hişk ya dijî gelê Kurd û zimanê wî heye!! Em vê biryara cezakirinê ya derheqê birêz Derwêşê Derwêş şermezar dikin, ji ber ku cezakirina rewşenbîran, cezakirina çand û ramanê ye, cezakirina mafê nerîn û derbirinê ye!  
**23.03.2009 Z-2621K**

**Ismayîl Umer**

**Axavkerê Fermî Yê Encumena Giştî Ya Hevbendiya Demokrat Kurd Li Sûriyê**

\*\*\*\*\*

### Heval Husên Koro ji nav me barkir

Li welatê xerîbiyê, Almaniya, di 18-04-2009 an de, heval Husên Koro çû ser dilovanya xwe.

Ew di sala 1965 ar de, li bajarê Qamişlo ji daiyk dibe.

Di sala 1993 an de, ji ber belavkirina daxuyana li ser zagona serjimara awerte, ew û gelek hevalên xwe yên ji **Partiya Yeketî ya Demokrat A Kurd li Sûriyê "YEKÎTÎ"** têne girtin . Ji ber zordariya rijîma Sûriyê û astengiyên jiyana rojane, ji neçarî goçberî welatê xerîbiyê dibe. Di 26-04-2009 an de, Termê heval Husên digihe Qamişlo, bi beşdariya xwedî, heval, hogir û hêzên Kurd tê veşartin. Li ser gornê, sê gotin , yek ji aliyê serokê Partiya Yeketî ya Demokrat A Kurd li Sûriyê "YEKÎTÎ", Ismaîl Omer , ya din ji hêla dostekî ve û ya siyem ji hêla malbata wî ve pêşkêş dibin.

Bi navê komîta rêvebir ya belavoka NWEROZê û xwedevanên wê, em serê xwedî, heval û hogiran saxdikin.



### Rûniştina Demdirêj Pirsgirêka Şaristaniya Nûjen e!

#### Tenduristî

Ji êtirnêt... Hin lêkolînên ku li derbarê pêwendiya di navbera çalakiyên govdeyî û tundurustiya mirov de li zanîngehên Sîdnî û Kwîzin Land li Ustralya hatine kirin, diyar dikin ku gelek ziyan ji rûniştina demdirêj peyda dibin, û metirsiya ku mirov bi janên demdirêj keve jî pir bilind dibe. Ew metirsî gefeke îjdl e, û gengaz peydabûna gelek nexwaşyan peyda dike.

Lêkolînan bi şêweyekî zelal diyar dikin jî, ku zor pêwîst e çalakiyên govdeyî li ba mirov werin kirin, û dibêjin jî gerek e ew çalakî ji pileya orte û giran bin û ne kêmtirî sî xulekî di rojê de bin. Ew lebata govdeyî metirsiya qelewbûnê û nexwaşiyên ku pê re tîr pir kêr dike.

Raporeke li vê dawiyê di belavokeke Birîtanî ye bijîjkiya werzişî ye carane de jî hatiye belavkirin, wê jî xuya kiriye ku ku nofîne mezin ji kesên dewletên pêşketî û yên bi pêş dikevin jî, demake dirêj ji dema şiyarbûna xwe (ku dora 15.5 kat in), çalakîne bêliv dikin û bi demdirêjî rûdinin, di ew rerwşên bêliv de xerckirina govde ji wizeyê dadikeve pileya herî nizim, ew yek jî asteyên bi pêketina nexwaşiyên ku bi rûniştina demdirêj tîr, bilind dike, mîna jana Şêkir û janên dil û rihên xwînê. Loma jî, lêkolînan dibînin, ku gerek e pêguhaneke berçav û bi şêweyên nû di warên çareserkirina qelewbûnê de were kirin, da ku mirov kani be ji ziyarên tendurustî yên ku ji jiyana karên ((bêliv)) peyda dibin, biparêze.

Lê lêkolînan mêlag dikin, ku dijwarîne îjdl di warê çareserkirina qelewbûnê de li pêş pisporan hene. Dijwariya herî sereke jî, çawahiya guhertina jiyana bêliv e, û dîtina rêkîna ku dema rûniştina demdirêj pê kêr bibe. Ji wan rêk û şêweyan, guhertina şêweyên kar, xemrevandin, çûnûhatin, rêwîngî û bilî wan.

**Bijîşkê Newrozê**

### Bijartinek ji helbesta Erebi

#### Ji weşanên nû

Ev pirtûka ku li despêka 2009an der çûye dubeşîye , beşek Erebiye , beşê di wergerandina beşa yekem ta zimanê Kurdiye , ji 144 rûpelan qetê biçûk pêk hatiye , li çapxana Dar elzeman – Şam çap biye , mamoste Ebram Şahîn ew wergerandiye zimanê Kurdî û nav nîşanên wê piştî wergerandina Kurdî evin :

1-Heskirinek ewarte ji jineke awerte re

2-Belqîs

Herdu helbestên jorîn , helbestên helbestvanê Erebi Nîzar Qebenîne .

3-namak ji penaberiye

4-çend rûpel ji dîwar çûna Mehmod Derwîş .

Ev herdu helbest jî yên helbestvanê Felestînî Mehmod Derwîşin .

Lê her pênc helbestên yên helbestvan Mehmod Elmaxot in .

5-namak ji gundre .

6-bi şev .

7- Baran û estêrne .

8- Payîza bîzmikan .

9- Bizdandin û gankirin

Li ber ronîya giringiya


wergerandinê di jiyana

zimanan de , û bitaybeti

di jiyana zimanê Kurdî de , memoste Ebram Şahîn hewildaye û cefvak nehindek kiriye ta ku ev helbestên jorîn ji Erebi wergerandi Kurdî .

Wî bivê westa xwe hêvî kiriye ku helbesta Erebi bi xwînerên zimanê Kurdî bide nasîn û pirtûkxana Kurdî dewlemend bike

Em jî ji aliyê xwe ve ev ton karên weha pîrozdikin. Hêvidikin ku armanca wergêr cibîbîne , û xebatên bi vî rengî her biçin pîrbibin .





## Di siyaseta hundirîn de, paşveçûn!

Rozad Elî

Ji havîna borî de, pirseke li ser zimanên xelkê Sûryê digere, nemaze jî li ba mirovê Kurd pirs wiha ye: Çima helwesta dewletê li ser hêz û kesên ku di warên demokratîk û rêzanî de dixebitin sertir bûye, bi taybetî jî di tenga gelê Kurd re?

Bi rastî jî, gava mirov şirîta bûyer û çalakiyên hêzên demoqrat li Sûryê, yên Kurd jî di nav de, di ber çavan re derbas dike, ew tiştine nû ku ji salên berê cidawaztir û bêtir nabîne. Li bervajî wê, li salên berê gelek çalakî û lebatên siyasî û civakî yên giring, bi şeweyekî êşkere ji hêla rikberên destlatê ve wek çalakiyên navendên rewşenbîrî, şevên rêzanî li gelek bajarên Sûriyê, û h.w.d dihatin kirin. Li wan deman, sazûmanzê û dezgehên xwe yên asayîşî, pir caran çavên xwe li ser çalakiyên ku li dervayî vîna wan dibûn dadimrandin, û ta radeke bilind guvaştina xwe li derbarê azadiya welatîyan jî sist kiribû, û ango destlat dilxwaz bû ku rûyekî rind raberî gelê Sûrî û bêtir jî raberî raya giştî ya cîhanî bike.

Lê gelo..! Çima destlatê li wê demê ew helwest digirt û niha jî wekî ku ew li xwe poşman bûye û dike dîsa bide saz û siyasîyên xwe yên hundurîn yên berê?

Mirov dibîne, ku piştî gurûpa destlatdar sozên xwe di guhertin û nûjenkirinê de bi cih nînin, bêhna genîbûnê jî ji her war û movikên dewletê hilkelî û rewşa aborî û jiyaneberî jî her diçe kaviltir dibe. Gurûpa destlatdar baş hestwar bû ku bawerîya hemî nofên gel ji dest çû, nemaze jî bawerîya tevger û saziyên ku doza guhertin û demokrasiyê dikin. Li ber roniya van rastiyan, gurûpa destlatdar pêkol dike, ku bi her hawakî li ser textê destlatê bimîne. Loma jî ew hewl dide ku tevgera

demokratîk ku berê ji hêla destlatê ve dorpeçkirî ye, hîn dorpeçkirîtir û bêçaretir bike, û rola wê di warên xebatên paşerojê de lawaztir bike. Lewre jî ew kar dike, ku çî derfet û kirde li hundurê welêt û li derve jî hebin bi dest xîne û ji bo xortikirina xwe bikar wine. Ji wan karên ku ji bo bicihanîna wê armancê pêwîst û giring in, yek jê lawazkirin tevgera demokratîk e, û yek din jî tirsandin û êşandina hemî welatîyan e.

Di meydana binpêkirina azadî û berjewndiyên welatîyan de bê bend bibe, û bi hişkî li hember çalakiyên siyasî û civakî jî radiwest e.

Bi rastî jî, li dema ku îdara Emerîkî ya berê hebû, dihat dîtin ku çawa gurûpa destlatdar razîbûna welatîyên Sûrî dixwast, û benê azadiyê jî piçekî sist kiribû. Lê piştî ku bahoza wê îdarê derbas bû, destlatê da hawê xwe yê berê û dîsa benê azadiyan kin kir û destê xwe li stuyê welatîyên Sûriyê guvaşt. Em vê yekê ji ba xwe nabêjin, destlat bi xwe û bi şeweyekî zelal û êşkere dibêje, ku va ye C.Boş çû û em man, û bila tev zanibin ku em niha ji berê bi hêztir in!?

Bi rastî jî, tiştêkî hîç ne normal û xwezayî ye û cihê şerm û mixabiniyeke giran e jî, ku destlatak helwest û siyastên xwe li derbarê gelê xwe, li gor têkliyên xwe bi filan dewletê re, yan bi hebûn û nebûna serokê bêvan dewletê re bajo . Ev reng ji birêvebirina destlatê, di siyasîyê de radeya herî keysebaz e.

Belê, rastî jî ev e, ji ber ku destlat destlata me ye, em berê wê nas dikin, û em dizanin jî ku çiqasî rêberên Partiya Be's di wan waran de pispor, xwedî taqe û behrek in.

Ev siyaseta wan penda Kurdî ya ku dibêje: ((Gur 'eyarê xwe navêje)), bi cih tîne, û mêlag jî dike ku ew pend di siyasîyê de jî rast e!!

## Dadweriya aqilmendekî

Rêberê Silivî

Weke gelek Kurdên me yên belengaz û perîşan, ku ji dest xizaniya malmîrat a çend sal in li deverên Kurdî di Sûriyê de kon vegirtiye, dost û hevalê minî Kevin, **Eliyê Azîzî** jî, tevî kufletê xwe yê giran, ji bo kar, ji bo man û jîyanê, gundê bav û bapîran li şûn xwe hiştiye û li bajarê **Şamê** cîwar bûye. Weke berê, tevî xaniyê bi kirê, tevî kêmbûna derfetên kar, tevî destengî û rewşa wî ya aborî a xirab jî, ew mirovekî dilfireh, mêvanhez û têrgotin e, gelek çîrok, metelok û serpêhatiyên bav û kalan ji ber kirine. Nîsana vê salê, min beşdarî di şevbuhêrkeke wî de kir, hin çîrok û serpêhatiyên xweş ji me re gotin, naveroka yekê ji wan jî ev bû:

Aqilmendekî zîrek û hişmend li deverê welêt dijî, hemî problemên xelkê wê deverê li ser destê wî çareser dibûn. Kurekî wî hebû, dilê wî bi dadweriya bavê wî ne xweş bû, piştî wî ji biryarên wî ne rast û bi gûman bû. Rojê buharê, ew li hespa xwe siwar bû, ji malê derket û li konekî buhariyan bû mêvan. Xwediyê malê bi du jina ye, jina mezin bê zarok e û ya biçûk kurekî şîrmij li ser desta ye.

Dem, piştî nîvro ye, xwediyê malê bi pez û sewalên xwe ve mijûl e. Mêvan, li milê zilaman, serê xwe danî ser balgihekî da hinekî vehese. Dengê jina biçûk kete guhê wî, ji hewiya xwe re dibêje: "Ezê herim hin qurmik û qirşikan ji çolê bînim, vaye min kurê xwe di dergûşê de razandiye, hema haya te jê hebe". Hewiyê jê re got: "Bila". Dema diya lêwik ji bin kon derket, sed û yek gûman di serê mêvên de geriyar, weke sed kes jê re bibêje: "Mêvano! Çavên xwe veke, şiyar be, wê tewanek di bin vî konî de bigewime!!". Mêvanê şiyar, di bin çavan re dît ku hewiya jinikê dîq dike da zanibe ka bê mêvan razayî ye yan şiyar e.

Dema wê ew dirêjkirî dît, texmîn kir ku ew razayî ye, bi lez ew ji ber çavên wî winda bû. Mêvan, hêdî- hêdî, bê deng rabû ser xwe qelawizî lê kir, dît ku rahişte derziya dirûnê û ber bi dergûşa lawikê razayî ve çû, perde ser hilanî, bi hovîtî û dirindeyî ew derzî di xavika serê lawikê bê guneh de çikand û tê de winda kir, perde bi ser de berda û vegeriya cihê xwe rûnişt!! Kurikê reben, du deng girî kirin, lê, dengê wî yekcarî ji dinya ronak hate birîn!!..

Piştî ku mêvan ev bûyera bi seyr dît, ew jî vegeriya cihê xwe, serî danî ser bêlgih çav girtin heçku ew raza ye. Piştî demekê, diya lêwik ji çolê vegeriya, piştîyê xwe danî, mêrê wê jî li malê bû, dîna xwe dayê ku kurikê wê di xeweke giran de ye, li bendê ma da şiyar bibe wî şîr bide, lê lawik şiyar nebû!. Diya wî ew ji dergûşê deranî, lê malpepûkê çî bibîne!! Kurekî mirî, xiloxavî, bê giyan û bê can!! Kire qêrîn, kire hawar, bi tepan bi serê xwe ket, pora xwe kişand...Lê, hemî bê sûd û bê feyde ye, tu carî, girî mirî venegerandine!!..Hewiya wê jî xwe bi girî kuşt, di ber re ji diya lêwik re dibêje: "Ez rebena te me, te kurik kuşt, wî xiste dergûşê û derketî da tu xwîna wî têxî stuyê min!!".

Ji bo naskirina rastiyê, bavê lêwik, cendekê kurê xwe û herdu jinên xwe birin ber destê aqilmendê deverê, ango, bavê mêvan, ew mêvanê ku rastiyê hemî dizane û ew bi çavên serê xwe dîtiye. Lê wê ji tu kesî re nabêje ka wê biryara bavê wî rast be yan na!! Aqilmend xwe ji civatê bi dûr xist, gazî diya lêwik kir û jê re got: "Keça min, ma kesekî bi hiş li ser rûçkê vê zemîne heye **D.R (10)**



## Xema Giran

Enaeîte Mûrad

Zivistan sar û tar e , Narîn li ber êgir danşitî , zarok li hawîrdora wê dizîvirîn bi ken û şahî dilîstin . Narînê bi xemgînî li wan dimeyzand û temaşe dikir , hêstirên xwe bi dizî dimaland da ku zarî nizanibin ; ew digirî . Lê mixabin, girî li wê hêztir dibû, hêstirên wê balkêş û aşkere dibûn . keça mezin ya pênc salî , di cihê xwe de radiwestî bi dilşikestî berve diya xwe dihat , dipirsî û digot : Dayê ! Çima digrî ? Ez dixwezim , tu bi min re bilîzî . Keçik li ser tilyên lingan disekinî , xwe berejor hilidida û dîsan bang dikir . Dayê ! dimeyzînî , ku ez mezin bûme ? Ezê herime dibistanê , ne wilo ye ? . Narînê hêstirên germ berdidan û bi rûkî berkenî , digot : Belê keça min , ez pir şa me, ku tuyê ji pêre herî dibistanê. Keçik şadibû , diya xwe hembêz dikir û digot : Dayê , ka ji min re stiranekê bibêje ! . Narînê destê xwe di ser serê keça xwe re digerand û eniya wê ramûsa , bi dengêkî nizim wê stirana şivan perwer distira " Gelî şoreşvan ! Gelî şoreşger, em ji rê dernakevin ....Çiqas bibînî zilim û zor ... Ew li vê çerxa Cîhanê .. Geh li jêr û geh li jor" . Keçikê çavên xwe beq dikir û li diya xwe temaşe dikir û digot : Dayê ! Ev stirana ne xweş e, çi ye ew zilm û zor ? . Divê tu yeke dî xweşiktir , ji min re bistirê . Narînê , bê ku bersiva keça xwe bide , stiraneke zarokan ji wê re distira û digot : Xewke ,xewke , xewke ...Berxa min xewke û h.w.d . Bi vê awî zaroka xwe dikire xewê . Bi ser xwe de diponijî û bi pêşerojê mijûl dibû.. Ev zaroka mezin bûye , divê ji pêre biçê dibistanê . Lê zor mixabin dibistan keça min napejirîne . Gava ew rewşa kambax ,tarî û reş , li ber çavên Narînê re diçû û dihat , agir bi dilê

wê diket ,wisan jî keserên kûr dikşandin û di ber xwe de dipeyivî û digot :

Gelo ev çi jiyane ? ! Keça min ya ku peyva zilm û zorê nizane ? Ewê çawa têbigehe ku, ji ber ew keçrke Kurd e û ji kesên bênasname ye, vêca jî dibistan wê napejirîne ? . Narînê bi keserên kûr gotinên xwe berdewam dikirin û digot : Xwedê em Kurd dane lê, bêbexitiyeke dîrokî li me bûye û niha jî zarokên me , li dibistanan napejirînin. Gelo ev tonreng zor û setema bi vê hawî , li tu deveran û li serê tu kesî dî , ji bilî me Kurdan têye ajotin ?!. Narînê ev zordariya he û nasnamên me –bi zor – ji me sitandine û xak û zeviyên me jî ... piştê jî , dibêjin : Win biyanî ne ! . Bi vê awayî pir mafên me Kurdan dadiqurtîne !

Narîn hîn di wê destnavê de bû , wê pêjn û hêviyên xwe bilind dikirin û didît , ku demiqurasî li Sûriya me ya şêrîn-biha peyda bûye , wekhevî di nêv xelkê me de pêkhatî ! . Desthilatdaran biryar daye , ku kesên bê nasname nasnamên xwe werbigrin ,û weke berê ew li Sûriyê bibine hemwelatîyên rastîn . Narînê didît , ku jinên weke wê pêwîste bihevkevin , û berên xwe bidin pêşiya qonaqa serokê welêt û sipasiya wî bi vê boneyê bikin. Wê bi destê keça xwe digirt û dadikete kolanên bajarê Şamê, wê didît , ku jinên weke wê ligel zarokên xwe gelek in û hemû berê xwe dane serok û di xwepêşandaneke aştiyane de dirûşiman bi dengêkî bilind dibêjin . Narînê jî , weke wan destê xwe bi hêz radikir û digot : Bijî wekhevî ! . Bimre zordarî ! . Gava wê destê xwe bi hêz radikir û dihejand ; Wa hîngê , li piyala avê dest vedipekî, av dirjî û pêre jî ew şiyar dibû , ku çi bibîne ew li rex keça xwe raketiye , peyala avê şikestî û destê wê birîn bû ye .

## Çima alfebe û ne abe ?

Memê Alan

Her miletêkî ji tîpên zimanê xwe re navlêkirinek dît û lêkir . Wek nimûne gelê Erebiyê , ebcediyê "**Elêfba**" bi karanî , û gelên Latînî jî Alfebetîkal , Alfebêt , alfevêt ... bi kar anîn . Herweha wexta C.B tîpên Kurdî yên Latînî afrandine , navê alfebe lêkir .

Di dûre hinan alfabe , hinan jî alfebe , û hinên dî jî elfabe ... H.W.D bi kar anîn .

Dema mirov di hemî durvên jorîn temaş bike , wê têbîghê ku binesaziya hemiyar yek e , û hemî jî vedigerin binesaziya navlêkirina Yûnaniyan .

Lê , her miletêkî guherînek biçûk kiriye ya resen , û cilekî nû lêkiriye , ta ku li bejna zimanê wî were . Herweha nemirê me C.B di navlêkirina xwe de wê şopa ajotî .

Lê piştî danûstandinek mezin di saziya fêrkirin û parastina zimanê Kurdî li Sûriyê de , û şirovekirina vê navlêkirina C.B , me dît ev navlêkirina ne li gor form û bejna zimanê me ye .

Weke me li jor diyar kirî cudatî di lêvkirina wê de çêdibe , û herweha lêvkirina wê jî giran e .

Wêlomê jî , li ber ronîya pêşinyaza endamêkî saziyê , ku navlêkirina ( Abe ) şûna ( Alfabe ) yê bigre , me biryara wê navlêkirinê ji ber van sedemên jêrîn da :

- 1- Bilêvkirina wê ji ya berê hêsantir e , û bêtir li bejna zimanê me tê .
- 2- Berê zimanên jîndar berve hêsankirin û lezkirinê ye .
- 3- Binesaziya wê ji ya resen ne cude ye , tenê hin tîp hatine kurtkirin . Yanê avêtina hin tîpan ji ya berê ye .

4- Sûdegirtina ji aliyê dem û aborî ve ji ber ku kurtkirina hin tîpan , yanê kurtkirina dema bikaranîna wê ji aliyê bilêvkirin û nivîsandinê ve , û herweha sûdegirtinek aborî jî tê de heye .

Bi taybetî jî eger mirov serjimarekê , li dirêjiya dîrokek hinekî dirêj di pirtûkxana Kurdî de çêbike .

Li dawiyê û ji vir û wê ve , emê ( abe ) li şûna Alfebe di çarçewa saziya xwe de bikarwînin . Lê nayê wê wateyê ku sînga me ji hemî nêrîn û rexnên werin re ne vekiriye .

Herweha gengaz heye ku em ji biryarên xwe jî vegehin ger hin nêrînine dî berbiçavê me bikin , û bawriya me biguhêrin .

### Rojnemevanê Kurd Faroq Hecî Mistafa hate girtin

Faroq ji gundê Zerka- herêma Kobaniyê , Xewndekarê zanîngeha

Lubnanê, beşê

siyasî ye.

Di 05- 04- 2009 an de,

rojnemevanê Kurd

Faroq Hecî tê binçavkirin

û ta nuha jî hîn rewşa wî

ne xuya ye. Wî di pir Rojnemeyên Erebiyê de nivîsarên xwe weşandine "el-sefir, el-kîfah-al-erebi , el-heyat, el-lundiniyê , elweten elsûriyê" û H.W.D. Lewre jî di nav refên nivîskar, rewşenbîr û siyasethvanan de xwedî rêz û hurmet e.

Hêjayî gotinê ye ku, mamoste Faroq ji derketina derveyî welêt qedexe ye.





## Serokê DTP Xelata Zimên Werdigre

Amedekar: Hesênê Cumî

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di 18'ê Nîsana 1992'an de ji aliyê komek rewşenbîrên Kurd ve hate avakirin. Enstîtî ji bo salvegera avakirina xwe û ji bo dayîna **Xelata Zimên a Feqî Huseynî Sagniç** li navenda çanda Mecidiyekoy merasimeke li dar xist. Xelata îsal ji ber axaftina Hevserokê DTP'ê Ehmet Turk ya bi kurdî a di meclisê de. Turk xelata xwe ji destê jina Feqî Huseynî Sagniç girt.

Di axaftina destpêkê de, Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê Samî Tan qala avakirina Enstîtuyê kir, da zanîn ku di sala 92an de dema enstîtî hatiye avakirin, yekemîn serokê Enstîtuyê Musa Anter hatiye kuştin. Lê, di gel hemû zor û zordariyan, wan xebata xwe pêş xistiye, ferhenga mezin amade kiriye, ferhengên biwêjan derxistine û her wiha gelek berhemên din.

Tan got ku TRT 6 bi kurdî weşanê dike, lê dewlet hê saziyeke ku bi kurdî li ser kurdî xebatê dike nas nake û ev yek lê zêde kir: "Ji me dipirsin 'hûn çima TRT 6ê qebûl nakin?'. Niha tenê li Stenbolê zêdeyî 20 cihan Kursên zimên em didin. Li Tirkiyê, li gelek bajaran kursên me didomin. Mamosteyên me hene. Van nabînin diçin li Başûr, li Ewropayê li kurdîzanan digerin. ta me nepejîrîn, çima em TRT 6ê bipejîrîn." "Kurdî weşanê dikin lê Komeleya Tealî Cemiyetî wekî komeleye xirab bi nav dikin. Di weşana xwe de alfabeya Celadet Elî Bedirxan bikar tînin lê wî nabînin. Li Amedê pirtûkxana Mehmed Uzun nabînin lê, nizamim diçin çî dibînin?. Niha jî êrişan dikin. Emê li hemberî êrişan serê xwe netewînin."

Serokê Enstîtuyê Tan bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Ev ziman zimanê me ye, ev çand çanda me ye, em xwedî vî zimanî ne û emê xwedî lê derên jî."

Piştî wergirtana xelatê, birêz Turk weha dibêje: "Ez vê xelatê li ser navê şehîd û rewşenbîrên Kurdan digirim. Îro em ji bo

demokrasiyê û pîrsgirêka Kurd têkoşînê didin. Lê dewlet êrişan tîne ser me. ta îro gelê Kurd li ber van êrişan serê xwe netewandiye, ji îro pê ve jî gelê Kurd li hemberî kuştin, girtinan serê xwe natewîne.

Em biratî dixwazin, em wisa dixwazin pîrsgirêkê çareser bikin lê, ger hûn bi zordarî bîn ser gelê Kurd jî, dê gelê Kurd winda neke, hûn winda bibin.

Ta îro li ser zimên û çanda Kurd qedexa, asîmîlasyon hebûye, lê ta îro nikarîne pêşî li zimanê kurdî bigirin û ji îro û pê de jî wê nikaribin. Yên ku ji bo kurdî xebat kirine û dikin, divê mirov wan xelat bike".

Osman Ozçelîk: "Kurd çiqasî xwedî li zimanê xwe derkevin, ew qas dê pêş bikevin. Ziman gelan ji hev cihê dike. Loma em dibêjin zimanê me rûmeta me ye. Azadiya gelê Kurd, zimanê kurdî li pêşiya me ye. Ew roj ne dîr in."

Nivîskar Faik Bulut: "Ez nabêjim zimanê kurdî rûmeta me ye. Ez dibêjim zimanê me qedera me ye. Zimanê me tune be, qedera me jî tune ye."

### Çalakî

Bi helkeftina 111 saliya rojnamegeriya Kurdî, rêxistinên **Tirbespî, Aliya, Girkê Legê û Dêrikê** yên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ), ji bo xelatkirina girûpên çandî û sazûmanên mafên mirovan şevbiwêrkin li dar xistin. Şevbiwêrkan, bi rawestaneke bê deng li ser giyanên pakrewanên rojnamegeriyê, nemaze yên Kurd û Kurdistanê dest pê kirin. Di pey re, gotina Komîta Çandî hate xwendin.

Girûp û sazûmanên hatine xelatkirin ev bûn:

1. Komîta MAF.
2. Komîta DAD.
3. Koçka Cegerxwîn ya rewşenbîriya Kurdî.
4. Dîdargeha Girkê Legê.
5. Girûpa Dêrikê ya Çanda Kurdî.
6. Tevna Çand û Huner a Kurdî.
7. Baxên Jinên Dêrikê.
8. Girûpa Tirbespiyê ya Çanda Kurdî.

Piştî xelatkirinê, nûnerên girûp û sazûmanên xelatkirî, sipasiya partiya me kirin, herweha, ji bo berdewamiya kar û çalakiyên bi vî rengî, wan hevî û daxwaziyên xwe anîne zimên.

## Dumahîk : Dadweriya ...

bi destên xwe kurî xwe bikuje?!... Ez bawerim tu bê guneh î, lê, tiliyên gûmanê bal bi te ve jî hene, giringe tu wan gûmanan ji xwe dûr bikî.” Ewê pirsî:” Ez çi bikim aqilmendê hêja?”. Aqilmend lê vegerand û got:” Keça min, hema rabe ser xwe, delingê xwe bêxe, dawa xwe hilde , berê xwe bide civata zilaman û bêje: Bi Xwedê min kurê xwe ne kuştiye, yekser tê herî mala xwe!!.” Ewê, bi girîn, bi kul û kesereke kûr lê vegerand û got:

“Ma ez pepûk û porkura Xwedê, çawa li pêş vê civatê xwe berdime der, ma qey ne şerme, hetîketî ye apo?! Bera xwîna kurê min jî têkeve stuyê min û tucarî ez vî karî nebûyî nakim!!..”. Aqilmend gazî hewiya wê kir û jê re got:”Keça min, bawerî li nik min çê bûye ku diya lêwik ew bi destên xwe fetisandiye û tu bê guneh î...!!Lê, tu bikî nekî, tilî bi ser te ve jî diçin, ji bo ez biryara xwe bidim, divê tu van gûmanan ji xwe dûr bikî.” Hewiyê lê vegerand go: Ma ez çi bikim?. Aqilmend jê re got:”Hema rabe ser xwe, delingê xwe bêxe, dawa xwe hilde, berê xwe bide civata zilaman û bêje: Bi Xwedê min kurê hewiya xwe ne kuştiye.”. Jinikê, yek ne kir dido, go: Bera ez benî. Rabû, xwe daqûl kir da-delingê xwe bêxe û...Aqilmend bi zirt bang lê kir û got: “Hey bê şerm a bê fihêt, tê çi bikî?.Tu kujer î!!..”.

Kurê wî, yê ku bûyer bi çavên serê xwe dîtibû, destûra axaftinê ji bavê xwe xwest û ji civatê re got:”Belê bavo, biryara te rast e, ji ber ku min bi xwe dît bê çawa vê jinika bê ol, kurikê hewiya xwe kuşt, derziya dirûnê di xavika serê wî de çikand!!”. Çû derzî ji serê lêwik derxist û li ber civatê danî!! Hewiya jinikê jî li kiryara xwe mikur hat û di civakê de rûreş û riswa bû!!.

**Şam- 15ê Nîsana 2009Z-2621K**

## Hin çalakîyên rêxistina Heleb a P.Y.D.K.S

• Li heyva Nîsanê rêxistina xwendekarên zanîgeha Heleb a P.Y.D.K.S hin seyranên bi çûk, di hembêza sirûştta rengîn de, tevî dost û hevalan li dar xistin. Ew seyran li ber sazê tembûr û dirbegan, bi stranên folklorî, çepik û lîliyan, bi kêf şahî bi dawî bûn.


• Li 12-04-2009 an, rêxistina xwendekarên zanîgeha Heleb a P.Y.D.K.S, şevêk di bin navnîşana pirsgirêka têkliyên di navbera xort û keçên Kurd, di zanîngeha Heleb de, bi beşdariya dora 30 xort û keçî li dar xist.. Rêvebiriya şevê bi şewekî diyalgî, di çarçewa wê navîşanê de bir serî.

• Bi boneya roja rojnemegiriya Kurdî, komîta rêvebiriya rojnama YEKÎTÎ û NEWROZê, du şevên bîranînê li dar xistin. Herdu bi beşdariya dost û hevalan, li ser girîngiya ragiyandin û rojnemegiriyê di jiyana gelan de û bi taybetî di jiyana gelê Kurd de, hate rawestandî û herweha bi gelek pirs û bersivan ew şev xemilîn.

• Li 5î heyva Nîsanê jî şevêk di bin navnîşana pirsgirêka têkliyên di navbera siyaset û rewşenbîriyê de hate li dar xistin. Li wê şevê dora 20 kesên karê rêzanî û rewşenbîriyê dikin beşdar bûn. Rêvebirê şevê bi şewekî akadimîk şeva xwe domand.

## Cejna Çarşema Şor Pîroz Be

Bi boneya hatina Cejna sersala Êzîdiyên Kurd, hêviya me ew e ku, ev cejna olî ya resen bibe bingeh ji lihevhatina hemî baweriyên milletê me re.



Dilê Kurdên me yên bi baweriya ola Êzîdî li gel birayên xwe di xêr û xweşiyê de bijîn.

**Dumahîk : 22 Nîsanê ...**

Bêgûmane ku fermana Sultan Ebdilhemîd sebareî qedexkirina derçûna rojnameya Kurdistan ya berî 111 salan, fermaneke çewt û nemirovane bû. Lê, ji wê demê ta niha, cîhana me ya nûjen gelek bûyerên dilêş û guhertinên mezin di hemî warên jiyanê de dîtine. Du cengên cîhanî yê malwêran rû dane, bi dehê milyonan mirovên bê sûc û guneh bi agirê wan hatine şewitandin!! Herweha, derdora 70 salî, şer û nakokî di navbera rista dewletên sosyalîst û sermiyandar de berdewam kiriye, li her çar kenarên gerdûnê mafên mirovan talan û bînpê bûne. Piştî herdu cengên giran, û ji bo mafên mirovan li seranserî cîhanê bêne parastin, Rêxistina Netewên Yekbûyî (UN) hatiye damezrandin, mafê hemî gelan bi şeweyekî fermî parastiye. Herweha, di warê pêşesazî, têkildarî û ragihandinê de jî, cîhanê gavine fireh û balkêş avêtine, pîrensîp û nirxên nû hatine afirandin. Ango, mirov dikare bibêje, sembol û navnîşana vê sedsalê rêzgirtin û parastina mafên gelan û mirovan e.

Lê belê, diltengî û zikreşiya Sultanê Îslamê Ebdilhemîd, sînorên dewleta wî derbas kiriye, hewil daye ku destên xwe yê gemar dirêjî qirika rojnameya Kurdistanê bike, da wê bifetisîne, dengê wê bibire û Kurd bi tenê li vê cîhanê bê rojname, kovar û pirtûk bijîn û bêdeng bimînin...!!

Lê, her û her, rojnama me ya pîroz li ber xwe daye, xwe ji ber tîrên mirinê daye alî û xwe parastiye, tîrêjên zanîne li Kurdistanê belav kiriye.

Vêca, di siha evqas guhertin û bûyerên dîrokî de, çêdibe ev destelatên ku îro gelê Kurd di bin destê wan de ye, têkiliyê bi pîrs û zimanê Kurdî re mîna têkiliya Sultan Ebdilhemîd bikin û ew belge û biryarên rêxistina Netewên Yekbûyî bînpê bikin û qedexkirina zimanê Kurdî bidomînin?!!. Ma li gora kîjan zagonê ev rijîm xwe di çewisandina zimanê Kurdî de mafdar dibînin?!!

Li welatê me Sûriyê jî, hîna siyaseta qedexkirina zimanê Kurdî berdewam e, rijîma Sûriyê, li rastiya hebûna derdora 3 milyon Kurd ku lê dijîn mukur nayê, bi tundî şerê ziman, folklor û wêjeya Kurdî dike, zimanzan û çalakvanên zimanê Kurdî ceza dike û hewil dide ku vî zimanî ji holê rake. Ew ji bîr dike ku zimanê Kurdî li dirêjiya sedsalan, rehên xwe di hiş û dilê gel de kûr berdane, tu hêz nikare wî ji hiş û dilê gel derîne.

Bi vê boneya pîroz, em hemî rojnamevan, xwendevan, nivîskar, helbestvan, romanivîs û rewşenbîrên Kurd pîroz dikin, hêviya me ew e ku her ew li ser riya hîmdarê rojnameya Kurdî Mîr Miqdad Midhet û Mîr Celadet Bedirxan bi xwîna dilên xwe qelaştine berdewam bin, li zimanê Kurdî yê şêrîn xwedî derkevin û berevaniyê di ber hebûn û pêşvebirina wî de bikin.

Gurzek gul ji giyanê Miqdad Bedirxan û hemî Bedirxaniyan re!

Gurzek gul ji hemî xebatkar, çalakvan û nivîskarên zimanê Kurdî re!

**Komîta Rêvebir a Partiya Yekîfî**

**15.04.2009Z-2621K**

## Helbijartina Şaredariyê li Turkiyê

Reşoyê Pîrê

Gelê Kurd ji zû ve bi nasname û hestên kurdewariyê hewl dide him li Anqerê û him jî li Kurdistanê bibin pişikdarê desthilatdariyê

Di 29 ê Avdara borî de, helbijartinên şaredariyê li seranserê Turkiyê û Kurdistan dest pê kir. Di wê helbijartinê de, partiya Civaka Demokrat DTP, di herêma Kurdistanê, di pir bajar û navçeyan de bi serket " Amed, Şirnex, Êlih, Sêrt, Dêrsim, Wan, Çolemêrg û H.W.D. Ji ber ku Kurd li ser xaka xwe ne dewlet in û di şert û mercên îro de yekta riya desthilatdariyê bo Kurdan desthilatdariya herêmî ye û hilibijartinên herêmî herdem pêwîst in . Û ji bo Kurdan wateya siyasî ya helbijartna rêvebirên herêmî pir û pir mezin e.

Ew encama serkeftinê ku, milletê Kurd li doza xwe xwedî derketî ye û ji gelên cihanê re daye xuyan ku: Kurd azadîxwez in, ne şerxweaz in.

Gava mirov pîvanekê di navbera helbijartinên sala 2004 an ( ku DTP-ê li gora hilibijartinên sala 2004an şaredarên kevneşopiya DEHAP-ê divê hilibijartinê de ji lîsta SHP-ê beşdarî hilibijartinê bibûn) û yên îsal bike , wê bêguman serkeftina îsal û bi taybetî di dilê Kurdistanê " AMEDÊ"

de ber çav bibîne.

Lê divê ew serkeftna di helbijartinan de, - tevî berdeamiya şerê derûnî, biv, tirs û zixtên hemî dezgehên dewletê derketene hole, gelê me bi yek dengî got : Ev bawerîya me ye!. Ev vîna me ye!.

Piştî demeke kin ji dawîya hebijartinan Destlata Tirk Di 17ê Nîsanê de, operasyonên polisên Tirk li dijî Partiya Civata Gel DTPê dest pê kir, û pir kes girtin. Ev bûyera ha li dijî berpirsiyarên DTPê di serê mirovan de pir pirsan vedike. Ji aliyê dozger ve pir guneh hene, ew guneh çiqas rast in em nizanin. Dozger berpirsiyarên DTP bi kuştina serokê belediya Amedê Osman Baydemir ji aliyê PKKê ve tewanbar dike. Tê gotin, ku hukumeta Erdogan, Osman Baydemir ji kuştinê rizgar kiriye. Û Polis û leşkerên Tirkan di 23ê Nîsana îsal de, dîsa dane mêak kirin, ku her tiştên wan derew e. Leşkerên taybet li bajarê Colemêrgê bi awayeke hovane li zarokê Kurd 14 salî dan û ew pir birîndar kirin.

Bê guman divê şaredarên me Kurdan vê serkeftna xwe biparêzin û pêşdetir bibin.

Sedcar ev serkeftin li gelê me pîroz be û .

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de*